NÛÇEYÊN KURDÎ STANDARDÊN NAVNETEWEYÎ...

04
HEJMAR

# BOTAN TIMES

EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

## WELAT HEJIYA

BOTAN TIMES

**Ji Semsûrê re çi lazim e?**
Murat Bayram

**"Derîyê Sînor yê Nisêbînê vekin!"**
Gulistan Korban

**Di dema erdhejê de divê hûn çi bikin?**
Gulistan Korban



BOTAN TIMES
*Nûçeyên kurdî, standardên navneteweyî...*

Xwedî
**Botan International Medya Ltd. Şti.**

Edîtor/Nûçegihan
**Gulistan Korban Rençber**
**Berîl Caymaz**

Edîtor
**Murat Bayram**

Wergêr
**Yonca Sarsilmaz**

Rûpelsazî
**Ridwan Xelîl**

Bergsazî
**GrafîKURD**

www.botantimes.com

**BOTAN INTERNATIONAL MEDYA LTD.**

Xwedî
**Murat Bayram**

Midûr
**Yonca Sarsilmaz**

Pispora Pêşdebirina Çavkanîyan
**Kubra Sagir**

Şêwirmendê Weşanê
**Omer Faruk Baran**

www.botaninternational.com

EUROPEAN ENDOWMENT FOR DEMOCRACY

Fona Ewropayê ya Demokrasîyê piştgirîya Botan Internationalê dike.
Hemî berpirsiyarîya naveroka Botan Timesê li ser Şirketa Botan International Medya Limitedê ye.

BOTAN TIMES

BULTENA HAFTANÊ YA NÛÇEYAN



# NAVEROK

Ji Semsûrê re çi lazim e? .... 4

Karsazên Amedê: Bi lezgînî Derîyê Sînor yê Nisêbînê vekin! .... 5

Di dema erdhejê de divê hûn çi bikin? .... 6

Li Diyarbekirê jiyana piştî erdhêjê çawa ye? .... 8

Agahiyên herî dawî yên erdhêjê: Hejmara miriyan bilind dibe .... 10

Serokkomariya Tirkiyeyê: Jimara miriyan 2921 e! .... 12

Parêzgeriyê qedexe kir: Ez ji guhdarên xwe lêborînê dixwazim! .... 14

# Ji Semsûrê re çi lazim e?

Murat Bayram   Sibat 11, 2023



Semsûr

Li bajarê Semsûrê piranîya xaniyan an yekcar herifîne an jî zerer lê bûne. Welatî naxwazin ji kavilên xaniyên xwe dûr bikevin. Ji ber wê di sermayê de li derve dimînin.

Ji bilî çadiran tûwaletên seyar, cilikên stûr, xwarina hazir (taybetî xwarina ji bo zarokan) lazim e.

Li gor çavdêriya me gelek xanî mane ku xebatên ji bo rakirina xerabeyan dest pê nekiriye.




# Karsazên Amedê:
# Bi lezgînî Derîyê Sînor yê Nisêbînê vekin!

Gulistan Korban Sibat 10, 2023



Nurulah Edemen, Serokê Karsazên Amedê



Roja duşemê 10 bajarên Bakur bi du erdhêjên bi navenda Mereşê çêbû hêjiyan.

Erdhêj ne tenê li welatê me her wiha li cîranê me yê Suriyeyê jî bandoreke mezin kir û rê li ber felaketeke mezin vekir.

Tê gotin ku heta niha li Suriyê 3 hezar zêdetir mirov jiyana xwe ji dest daye. Bi hezaran kes jî hêj di bin xirbeyan de li benda alîkariyê ne.

Serokê Komeleya Pîşesaz û Karsazên Amedê Nurullah Edemen, ji  bo alîkarî bişînin ji gelê Suriyeyê re  bang li rayedarên hikumetê kir.

Edemen daxwaz kir ku derîyê Sinor yê Nisêbînê bo alîkariyên însanî demildest bê vekirin.

Serokê Karsazên Amedê dîbêje,

> *"Ji ber şer û pevçûnên li Sûriyê, sazîyên tenduristiyê nikaribin xizmetê bidin. Gelê Suriyê alîkariyên mirovî wernegirtine û di bin xirbeyan de kuştî û birîndar hene."*

Wî diyar dike ku ew ji bo alîkariya cîranên xwe yê Suriyê amade ne.

9 deriyên Sinorên yê Tirkiyeyê ber bi Suriyeyê ve vedibe. Ji wan yek jî Deriyê Sînorîn yê Nisêbînê ye.

Deriyê sînorîn ku ber bi bajarê Qamışloyê ve vedibe 10 sal e girtiye.

Ji ber gengenişya di navbera Rêveberiya Xweser ya Rojavayê Kurdistanê û hikumeta Tirkiyeyê, rayedarên Tirkiyeyê deriyê sînor venake.

Niha tenê Deriyê Sînor yê Cilvegozê ku li navçeya Reyhanlıya Hatayê cîh digre ji bo alikariyan vekiriye.

Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê MEvlut Çavuşoglu, piştî erdhêja 6ê Sıbatê ku bondorej zêde li bajarên Suriyêyê jî kir, diyar kir ku dê du deriyên din jî bo alikariyan insanî bê vekirin.

# Di dema erdhejê de divê hûn çi bikin?

Gulistan Korban  Sibat 08, 2023, Çavkanî: BBC Turkçe



Li Amedê kavila malekî

Li Tirkiyeyê roja duşemê bi pîleya 7.7 û 7.6 du erdhêj pêk hatin.

Ev yek bû sedem ku bi hezaran kesan canê xwe ji dest bidin.

Erdhêja ku bandor li 10 bajaran kir tê gotin ku di 10 salên dawîn de wekî erdhêjên herî zêde kes jiyana xwe ji dest daye derbasî dîrokê bûye.

Li Tirkiyeyê ku pir caran lê erdhêj lê çêdibin, di navbera salên 1939 û 1999an de 5 erdhejên mezin çêbûn.

**Pêşbîniyên erdhejê**

Zanyar dibêjin ku mirov dikare bizanibe ku erdhej li kuderê çêdibin. Lê zehmet e ku mirov bizanibe ka çi demî çêbibe.

Belê em dikarin erhêjan texmin bikin?

Erdhejnas Dr Stephen Hicksê ku li Imperial College Londonê peywirdar e dibêje:

> *"Em dikarin erdhejan pêşbînî bikin. Em dikarin îhtimalekê bidin. Pêşbînkirina erdhejê li deverên mîna California û Japonya her ku diçe bikêrtir dibe."*

Belê di dema erhêjê de ji bo ewlehiya xwe divê hûn çi bikin û çi nekin?

**Amade bin**

Her çend zehmet e ku meriv pêşbînî bike ka dê kengê erdhejek çêbibe jî, li gorî pisporan divê hûn her gav amade bin.

> *"Heke hûn li deverek erdhêj pir caran lê diqewime cih digrin divê çenteyeke we ya erdhêjê her hazir be." dibêje*
>
> *Dr Hicks.*

Divê di çenteyê de av, çira, kîta alîkariya pêşîn û xwarin hebe.

Li gorî Xaça Sor, divê hûn di çenteyê de pereyê nakit û belgeyên weyên taybet jî hebin.



**Ger bi ewle be, li cihê ku hûn di erdhejê de lê hatine girtin bimînin**

Li gorî Lêkolîna Jeolojîk a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (USGS), heke hûn li cihê ku erdhêj lê qewımi bimînin û nelivin, îhtîmala we kêm dibe ku hûn birîndar bibin.

Ji ber vê yekê navend şîret dike ku di bûyera lerzê de zû nerevin.

Ji ber ku lêkolîn nîşan dide ku piraniya birîndaran dema ku li dora avahiyekê digerin an jî hewl didin ku derkevin çêdibin.

Pispor balê dikişînin ser sê peyvên ku dê ewlehiya we misoger bikin: "Xwezandin, girtin, ragirtin".

**Malpera AFAD û pêşniyara USGS ev in:**

-Serê xwe di navbera destên xwe de an jî bi materyalek parastinê (balg, pirtûk, hwd.) biparêzin.

-Li bendê bimînin heya ku lerzîn kêm bibe û li cîhek ewle dakevin ser çokan.

-Bi awayekî ku "ser û stûyê xwe biparêze veşêrin" û xwe li cîhek aram bigirin da ku nekeve.

-heya ku hejandin raweste, li cihê ku hûn lê ne bimînin.

Derî yek ji wan cihên pêşî ne ku di bûyera erdhejê de cîh digirin. Lêbelê, heke avahî avahiyek kevn be û derî ne bargir bin, pispor dibêjin dibe ku tabloyên binê maseyê ewletir bin.

Cam û pencere bi gelemperî cîhên yekem in ku di dema erdhejê de têne şikandin an hilweşandin.

Pispor şîret dikin ku ji van deveran dûr bisekinin.

**Ger ew ewle be, derkevin derve**

Dema hejandin qediya, li ser ixtimala xirabûna malê divê hûn ji avahiyê derbikevin.

Pêşniyarên ku heya niha hatine dayîn ji bo kesên di avahiyê de rastî erdhêjê hatin bûn.

**Lê ger hûn li derve bi erdêjê re rû bi rû man hûn ê çi bikin?**

Pispor dibêjin: "Li cihê ku hûn lê ne bimînin." Dûrî avahî, kabloyên elektrîkê, çalan, xetên sotemenî û gazê, bibin ku birîndar nebin."

"Li deverek vekirî dûrî daran, stûnên têlefonê û avahiyan bisekinin."

Lêbelê, di demên şert û mercên hewayê yên dijwar de, wek erdheja li Tirkiyeyê, hewce ye ku li derve sitargeh werin danîn.

*Hin welat her sal tetbîqata erdhejê dikin û ji her kesî re tê nîşandan ku çi bike.*

*Yekemîn tetbîqata erdhejê ya li Tirkiyeyê di Mijdara sala borî de hatibû lidarxistin.*

# Li Diyarbekirê jiyana piştî erdhêjê çawa ye?

Murat Bayram Sibat 08, 2023



Taxa Ofîsê

Mertê yeksalî dema li kameraya me dinêrî berf dibarîya. Ji serman lêva wî mor bûye û rengê sor li ser rûyê wî diyar dibe.

Mert yek ji niştecihên Diyarbekirê ye ku li kolanan dijî. Li gor Platforma Hevgirîya Ji Bo Parastina Bajarî zêdetirî 200 hezar kesan li derveyî mala xwe dijîn.

Hinek ji wan li trênan, hinek jî li erbeyan, hinek li mizyeft û hinek jî li mekteban dijîn. Tê texmînkirin ku zêdetirkî nîvê niştecihên bajarî(500 hezar) çûne gundên bajarî.

Li Diyarbekirê piştî erdhêjê zêdetirî 20 malan xera bûne lê zerer li gelek malan bûye û welatî newêrin vegerin mala xwe. Li parka Koşûyolûyê 80 çadir hatine vedan. Şeva didoyê ez jî li wê derê bûm. Li gor welatîyan bi tenê sibeyê danek xwarin ji wan re çûye. (lalîkek nîsk û du parçe nan). Seet 10ê careka dî nîsk hat dayin.

Malbata Mertî ne ew qasê bi şans bûye ku çadireka wan hebe. Berf dibarîya û bayeka wek laşê mirovan bibire tê.

Diya Mertî li ser wan çadirek vegirtiye lê têrê nekiriye hemî aliyan bigire.



Mertê yek salî



Mertê yek salî

## Alîkarî tê lê adilane belav nabe

Welatî alîkarîyan rêdikin dema em îro çûyîn du caran erebeyên welatîyan betenî û dar anîn.

Sevda Kaya dibêje goreyek nîne bike pê zaroka xwe. Du zarokên wê li bin betenîyekê ye. Ew dixwazin betenîyeka dî jî bistînin lê her cara alîkarî tê hin kes di rê de hemîyê distînin ti caran dor nayê wan. Wê pê keça xwe nîşan da.

“Goreyek jî nîne em bikin pê keça xwe.”

“Keçeka min nexweşa SMAyê ye. Enfeksîyona wê zêde bû me ew bir nexweşxaneyê. Xwarin ji bo mezinan tê lê zarok birçî ne. Min mama xwest.

Bi tenê qutîyeka biçûk hatiye. Di paşiya erebeyekê de malbata Sevdatê digel 3 malbatên dî dimîne.



Belavkirina daran



Ayşe Batuhan

## Min dengê keça xwe bihîst!

“Harunê min, neviyê min 4 salî ye. Wî xelas bikin!” Ayşe Batuhanê bi kela girîyê bi van gotinan dest bi axiftinê kir.

Roja sêyem a erdhêjê ye. Dinê gelek sar e. Agirek hatiye kirin û her kes li dora wê kom bûne.

Zelamê Eyşeyê, kurê wê, bûka wê û du neviyên wê li bin vê avahîyê de mane.

Sê roj in deng ji avahîyê tê lê jimara xelaskeran kêm e. Hêj dora derêxistina wan nemaye. Roja sêyem bi tenê du deng hatine.

Jinekê ji piştê ve got “yek ji wan qêrînîyan qêrîna keça min bû. Van guhan du caran qêrîna wê bihîst. Em nikarin tiştekê bikin. Bêçaretî gelekê giran e.”

Ayşe Batuhanê got:

Sê roj in ez li vê derê me. Em ji Sêrtê hatine. Ez xerabeyên xaniyê kurê xwe jî dibînim sebra min tê. Nikarim ji vê derê biçim. Lê dewlet çadirekê jî nade me. Wezîfedarên rakirina xerabeyan kêm in. Em şevê çûn mizyektê melayî gaz girtiye. Ji serman em derketin.”

Li hin firinan nan ji 7 TLyan bûye 15 TL. Dema bû şev em bi erebeyê li nava bajarî geriyan. Bajarê ku zêdetirî milyonek kes lê dijî vala dixweyî. Ronahiya kêm malan ji pencereyê xuya dikir.

# Agahiyên herî dawî yên erdhêjê: Hejmara miriyan bilind dibe

Gulistan Korban Sibat 07, 2023



Wêne: Murat Bayram- Li Amedê piştî erdhêjê kavilê malekî

11 bajarên Tirkiyeyê roja Duşemê bi du erdhêjên bi lerza 7.7 û 7.6 hêjiya.

Erdhêja ku navenda wî Mereş bû hê jî ji bo rizgarkirina welatiyan li wan bajaran kar û xebat berdewam dike.

Li gor daxuyaniya Serokatiya Rêveberiya Karesat û Rewşên Bilez (AFAD) hejmara qurbaniyên di erdhejê de canê xwe ji dest dane gihiştiye 3 hezar û 381 kesan.

Hejmara birîndaran jî 20 hezar û 426 kesan derbas kiriye.

Herwiha hate ragihandin ku 7 hezar û 840 kes jî ji erdhêjê hatine rizgarkirin.

Li tevahiya Tirkiyeyê ji ber erdhejê 7 rojan şîn hat ragihandin.

**Wezîr Kurum:**
**"Rêya Edene û Entapê hate vekirin"**

Wezîrê Jîngeh, Bajarvanî û Guhertina Avhewayê Murat Kurumê ku li Antepê axivî ji bo Edhêjê got, "di sed salê careke de tişteke bi vî rengî rû dide."

Kurum ani ziman ku li Antepê 468 kesan canê xwe ji dest daye û diyar kir ku rê ya Edene- Antepê ji bo welatiyan hatiye vekirin.

**Zarokek 2 mehî**
**ji bin kavilan hate derxistin**

Ji ber erdhêja li Mereşê, ji aliyekî ve hejmara kesên jiyana xwe ji dest da bilind dibe. Li aliyekî ve jî ji bin kavilan agahiyên kefxweş tên.



Wênе: Murat Bayram- Li Amedê piştî erdhêjê kavilê malekî

Li Hetayê zarokekî 2 mehî piştî 29 seatan ji bin kavilan bi saxî hate derxistin.

**Tîmên lêgerîn û xilaskirinê yên Îsraîlê gihîştin Tirkiyeyê**

Ji aliyê Îsraîlê ve heyeteke alîkariyê ya ji 150 kesî pêk tê ji bo beşdarî xebatên erdhejê bibin hatin şandin, gihiştin Tirkiyeyê.

**Ji Çînê 6 milyon dolar alîkarî da Tirkiyeyê**

Televîzyona dewletê ya Çînê CCTV ragihand ku wê 40 milyon yuan (5,9 milyon dolar) ji bo alîkarîkirina gel û herêmên ku ji erdhejê zirar dîtine bê dayîn.

Xaça Sor a Çînê jî ragihand ku ewê 200 hezar dolar alîkariya lezgîn bidin Tirkiye û Sûriyê.

Koreya Başûr di nav wan kesan de ye ku piştî erdhejê destê alîkariyê dirêjî Tirkiyê kir.

Awûstralya û Zelanda Nû jî di nav wan welatan de bûn ku alîkariya ji bo Tirkiyeyê ragihandin.

**Bi hezaran dildarên alîkariyê hatin Balafirgeha Stenbolê**

Bi hezaran dildarên alîkariyê yên ji Stenbolê xwestin beşdarî xebatên lêgerîn û rizgarkirinê yên li herêmên erdhejê bibin hatin Balafirgeha Stenbolê. Li termînalê rêzên dirêj çêbûn.

Waliyê Stenbolê Alî Yerlîkaya ragihand ku ji saet 06.00an pê va ji Stenbolê 12 hezar û 752 personel û dildarên AFADê bi 73 balafiran sewqî herêma erdhejê kirin.

**THY: Heqê seferê ji herêmên erdhejê ber bi Stenbolê ve 100 TL ye**

Rêhewayên Tirkiyeyê (THY) hemû seferên vegerê yên balafirên ku alîkariyên însanî dibirin Edene, Diyarbekir, Şanliurfa û Elezîzê heta 13’ê Sibatê kirin 100 lîra.

**Ji CENTCOMê daxuyaniya erdhejê**

Fermandariya Biryargeha Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) der barê erdhejên duh li Kahramanmaraşê qewimîn de daxuyaniyek da.

CENTCOM ji bo êş, windahiyên trajîk û wêraniya ku ji ber erdhejên li Tirkiye û Sûriyeyê pêk hatine, sersaxiyên xwe yên kûr pêşkêş kir.

# Serokkomariya Tirkiyeyê: Jimara miriyan 2921 e!

Murat Bayram  Sibat 06, 2023



Li gor daxuyaniya Serokatiya Birêvebiriya Demên Hewarê (AFAD) 6ê Sibatê seet 4.17ê erdhêjeka bi bi pileya 7.7 çêbûye.

Platforma Hevgirîyêya û Parastina Bajarî: Li navenda Diyarbekirê 9 xanî xera bûne. Bi temamî li bajarî xanî xera bûne.

11:20 –

Jimara birîndaran bû 15 hezar û 834

Serokkomariya Tirkiyeyê ragihand ku jimara miriyan bûye û jimara birîndaran bûye 15 hezar û 834


Li Diyarbekirê herî kêm 7 xanî xera bûne. Li gor daxuyanîyên fermî li wî bajarî jimara miriyan 15 e lê li gor çavdêrîyên me jimar dê zêdetir bibe. Navenda Erdhêjê Mereş e û şiddeta wê 7.8 e.

09:00 –




06:30 –

Diyar Galeriya kevintirîn Malla Diyarbekirê bû. Li ser Mallê herî kêm 50 mal xera bûne



Ji Diyar Galeryayê 7 welatî bi saxî hatin derêxistin




Wlîtîya Diyarbekirê: 6 Welatî mirine.

04:40 –

**Murat Bayram**
@MiradBayram · **Follow**

Bînaya Galeryayê hatiye xwarê




4:59 AM · Feb 6, 2023

38 Reply Copy link



# Parêzgeriyê qedexe kir: Ez ji guhdarên xwe lêborînê dixwazim!

Gulistan Korban Sibat 05, 2023



Hunermed Azad Bedran

Konserên hunermendên Kurd bi sedemên cur be cur ji aliyê rayedarên hikumetê ve tên qedexekirin an jî tên asteng kirin.

Konsera hunermend Azad Bedranî ku li bêndê bû di 14ê Sibatê de Nisêbîna Mêrdînê pêk bê ji aliyê Parêzgeriya Mêrdînê ve hate betalkirin.

Hunermend Bedranî li ser biryara Parêzgeriya Mêrdînê ji Botan Timesê re dibêje,

> *"Ev ne meseleyeke şexsî ye. Mesele hunera Kurdî ye. Bi van biryaran dixwazin canda gel tune bikin"*

Wî dîyar kir ku ev ne yekem care konsera wî tê betalkirin û got,

> *"Beriya niha 2021an de jî cardin li konsera min ya navçeya Nisêbînê ji aliyê parezergeriya wê bajarê ve hatibû betalkirin."*

Parêzgeriya Mêrdînê ji 29 Çileyê heta 12ê Sibatê li tevahiya bajar çalakî û şahiyên girseyî qedexe kiribû.

Li gel konsera hunermendê Kurd di 14 Sibatê de ye jî parêzgerî destûra konserê nedaye.



Li gor hunermendê Kurd, armanca van biryaran qirqirina çandî ye û diyar dike ku;

> *"Mesele ne hunermend e. Ne Azad e. Ev jî şewazeke cuda ya binpêkirinê ye. Lê em ê her li dij vê zihnîyetê bi tebikoş in."*


Bedranê ku ji ber biryara parezgeriyê nekaribû bi guhdarên xwe re bê gel hev dibêje,


"Ez ji guhdaran lêborîna xwe dixwazim. Em ê hêj gelek caran bên cem hev û konserên xweş li dar bixin."

Di sala 2022an de jî hejmareke zêde hunermendên kurd bi astengiya û zehmetiyan re rû bi rû mabûn.




**Bixwîne: "Em rûyê sehneyan nabînin!"**
*https://botantimes.com/hunermenden-kurd-em-sehne-nabinin/*






# Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingeheka sazgehiyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

**Kovarên Endam**




/KovargerenKurd
KovargerenKurd@gmail.com

**BOTAN TIMES**

Endama Koma Kovargerên Kurd e